**Lîsteya pirsên Destpêkê di Rêveberiya Penaberiyê de (BAMF)**

1. Gelo hûn dikarin ji bilî zimanek an zimanên ku berê li vir hatine tomarkirin bi zimanekî an zaravayeke din biaxivin?

2. Gelo we nasnameya welatekî din hebû yan niha heye?

3. Tu ji kîjan netewe yan eşîretê yî?

4. Gelo hûn dikarin belgeyên nasnameya xwe, wek pasaport, yan belgeyeke din a ku dewsa pasaportê digire an jî karta nasnameyê bidin me?

5. Gelo we li welatê xwe belgeyên wek pasaport, yan belgeyeke din a ku dewsa pasaportê digire an jî karta nasnameyê hebû?

6. Sedema ku hûn nikarin ti belgeyekê bidin me çi ye?

7. Gelo hûn dikarin belgeyên din ên we (wek bawernameya xwendinê, belgeyên jidayîkbûnê, karta eskeriyê, bawernameya ajotinê) bidin me?

8. Gelo we li Komara Fêdêral a Almanya yan jî li welatekî din vîza/mafê rûniştinê heye yan jî we berê hebû?

9. Ji kerema xwe navnîşana xwe ya dawî ya fermî li welatê xwe bidin me! Berî ku hûn ji welatê xwe derkevin hûn li wê navnîşanê diman? Ger na, hûn cara dawiyê li kuderê dijiyan?

10. Ji kerema xwe re navê hevjîna/ê xwe, navê xwe yê duyem, roj û cihê jidayîkbûnê û roj û cihê zewacê ji me re bêje! Hûn dikarin di vî warî de belgeyekê nîşanî me bidin an jî paşê ji me re bînin?

11. Hevjîna/ê we niha li kuderê dijî, navnîşana wî/wê çi ye (eger hevjîna/ê we êdî li welatê we najî, ji kerema xwe navnîşana wî/wê ya dawî li navxwey welat û navnîşana wî/wê ya niha bidin me)?

12. Zarokên te hene? (Ji kerema xwe nav, paşnav, roj û cihê jidayikbûna hemûyan û navên zarokên ku ji hejde salî mezintir in jî bidin me)? Gelo hûn dikarin di vî warî de hin belgeyan bidin me an jî paşê ji me re bînin?

13. Navnîşan û cihê rûniştina wan li kuderê ye? (Eger zarok êdî ne li welatê we ne, ji kerema xwe navnîşana dawîn ya zarokan dema ku li welatê we bûn û navnîşan û cîhê rûniştina wan a niha bidin me.) Gelo hûn dikarin belgeyên vê yekê bidin me an jî paşê ji me re bînin?

14. Ji kerema xwe nav, paşnav, navnîşan û cihê rûniştina dê û bavên xwe ji bo me diyar bikin!

15. Gelo ti xwîşk û birayên we, dapîr û dapîr, xal, mam an met û xaletên we hene ku li derveyî welatê we dijîn?

16. Kîjan xizmên we hê li welatê we dijîn?

17. Nav û paşnavê kalikê te, wate bavê bavê te çi ye?

18. Gelo hûn heya çi radeyê çûne dibistan yan zanîngehê?

19. Tu hînî kîjan karî bû yî û te di kîjan waran de kar kiriye? Te cara dawî ji bo kê an li kuderê dixebitî? Gelo ti karekî te hebû?

20. Gelo tu çûyî leşkeriyê?

21. Tu berê li Komara Fêdêral a Almanya bûyî?

22. Gelo te berê li welatekî din daxwaza penaberiyê kiriye yan mafê penaberiyê ji te re hatibû dayîn?

23. Ji bo ti yek ji endamên malbata we berê li welatekî din serlêdana penaberiyê hatiye kirin an mafê rûniştinê wergirtine? Gelo ew bi awayekî yasayî li wî welatî dijîn?

24. Gelo li welatekî din li dijî serlêdana we ya penaberiyê hîn jî pêvajoyeke taybet heye?

25. Ji kerema xwe ji min re bêje ka tu çawa û kengê hatî Almanya. Di vî warî de, ji kerema xwe ji me re bêje kengê û çawa ji welatê xwe derketî, heya ku tu hatî vir ji kîjan welatan derbas bûyî û çawa te karî derbasî Almanya bibî?
Niha divê kesê/a penaxwaz li ser danasîna sedemên penaberiya wî/wê biaxive û sedemên hatina xwe ji bo Almanya û derketin ji welat bêje. Ji wî/wê tê xwestin ku wan sedeman bas bike ku ji ber wan di qada siyasî de rastî gefan hatiye.

Çavkanî: Protokola Danasîna Serlêdana Penaberiyê